

**Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê
Azadî ji Çalakvan û Xebatkarên
Zimanê Kurdî re!**

Beyaniya roja Sêşembê 13.01.2009an, dezgeha ewlekariya rêzaniyê(siyasiyê) li bajarê Qamişlê dest daniye ser rewşenbîr û zimanhezanê Kurd Derwêş ê Xalibê Derwêş(1945), ew ji mala wî biriye, paşê ew guhestiye bajarê Heseke û ta niha rewş û çarenûsa wî ne diyar e. Herweha, roja Şemiyê 17.01.2009an, birêz Fewazê Kano(1960), û birêz Zekî Ismaîlê Xelîl(1977) ji bal wê dezgeha ewlekariyê ve hatine girtin.



Sûc û gunehê van hersê nivîskar û rewşenbîrên me yên Kurd ew e ,ku ew guhdanê li zimanê dayika xwe dikin, pê dixwînin û dinivîsin, wî didine xwendin û fêrkirin û mîna evîndarên ziman û toreya Kurdî di civakê de hatine naskirin.

Ma gelo guhdana li zimên û toreya Kurdî gunehkarî û tewan e?. Ma gelo zimên, tore û zargotina gelê Kurd ne parçeyek ji tore û folklorê netewiya welatê me Sûriyê ye?!..Ma gelo parastin û geşkirina zimên û zargotina Kurdî ji çanda mirovatî û ya navnetewî re ne zengînî û dewlemendiye?!.

Bi navê Komîta Kovarên Kurdî li Sûriyê, em dengê xwe bilind dikin û dibêjin:

Azadî û serbestî ji çalakvan û xebatkarên zimanê Kurdî re..!

Azadî ji hemî girtiyên nerîn û derbirînê re..!

**Komîta Kovarên Kurdî Li
Sûriyê 19.01.2009**

Dumahîk: weke mi ewêê

mirovan û çalakvanên civaka sivil, mil li mil, ji bo doza vî gelê reben î perîşan xebatê bikin û têkiliyên dostaniyê bi hêz û partiyên sûriyê re saz bikin û bihûnin. Di nerîna min de, xebat bi vî rengî baş dibe.

P5-ji keç û xortên Kurdan re çi dibêjî mamo?

B5-Gereke ew bi doza gelê xwe mijûl bibin, bê westan kar û xebatê di ber doza wî ya dadmend de bikin, erk û stubarên xwe hilgirin, fêrî xwendin û nivîsandina zimanê dayika xwe bibin û wî bidin xwendin. Ziman, folklor û zargotina Kurdan dewlemend û zengîn e, cihê pesin û serbilindiyê ye. Ez navtêdanê di nifşê nû didim ku ew zend û bendan vemalin, bi mîrxasî barê zimanê xwe hildin ser milan.

Mamo sipas ji te re, em hêviya tundurustiyê saxlem û baş, temenekî dirêj, dûrî nexweşiyê ji te re dikin. Hûn li ser riya xebata Kurdayetiyê nimûnene geş û bi ronak bûn, bi saya xwedê û serê têkoşerên mîna we, îro em li ser vê riyê berdewam dikin . Careke din sipas.